

Kurdisk-kurmanji

Prensesa li ser şoqilê

- Çîrokek ji Danîmarka





Carek ji caran presek hebû. Wî prensesek dixwest, lê divîya bû ku ew prenseseke rastîn be. Ji ber vê yekê, ew li seranserê cîhanê geriya, lê li her derê tiştek derdiket pêşîya wî.



Gelek prenses hebûn, lê wî nedizanî kîjan rastîn e, û herdem kêmasîyek e wan didît. Ji ber vê yekê, herdem bi xemgînî vedigerîya malê, ji ber ku wî gelekî dixwest presesêke rastîn ji xwe re bibînê.



Rojekî dema ku hewa pir nexweş bû, bi birûsk, bahoze gelek baran bû, yekî li dergehê bajêr da.
Mîr ê pîr çû kû dergeh vekê. Li pişt dergeh prensesek hebû.




Lê ew mîna prensesekî xûya nedikir. Ew ji ber baranê şilûpil bûbû, û av ji cilên wê diherikî û ji pêlava wê derdiket.



“Belê, em ê dê bizanibin ka tu presesa rastînî!” şabanî ya pîr ji xwe re got. Şabanîyê tişteke negot, lê çû hundurê oda razanê û libek şoqil deynî ser text. Dûvre wê bîst doşek û bîst lihêf danîn ser şoqilê. Divîya bu kû prenses wê şevê li wir razê.






Serê sibehê mîr û şabanîyê jê pirsîn ka ew çawe razaha bû. Prensê got, “Ax, gelekî nexweş bû!”, “hema bêja xew ne kete çavê min de! Min wisa hîs kir ku di nav cih nivînan de tiştek heye. Ez li ser tişteke hişk razaham, ji ber wê yekê laşe min hemû şînûreş bu ye! Ev karesateke mezin e!” Dîtin kû ew preseseka rastîn e, ji ber kû wê şoqil di nav bîst doşek û bîst lihêfan de ferq kiribû.



Tenê presesek e rastîn dikarê bi wî şêweyî hestîyar be. Ji ber kû prens nuha dizanîbû kû ew prenseseke rastîn e, ew kire hevjin a xwe,



û şoqil deynîn pêşangehê. Heger tu kesî şoqil nebiribe, ew hîn jî li wir tê dîtin. Çîroka me qediya,
xêr û xweşî li hazir û guhdaran bariya.



Finn flere fortellinger på morsmal.oslomet.no

Fortellingen er laget med figurer og tegninger fra Aursmoen barnehage